Grûbên civakî yên xebatê Beledîya (SIG) Borlänge

BORLÄNGE

Grûbên xebata civakî (SIG) çine?

- SIG grûbek hevkar ji bo ciwanên 13-25 salî ye.
- Destûr ji welîyê zarokê û ji wê zarokê tê stendin, paşî meqamên resmî yên cuda, li ser bingeha ihîiyaca mirovê ciwan kom dibin.

- Temsîlkarên meqamên resmî herî pir ji xizmeta civakine(koordîne kirin jî), polis, asîstanê tetbîqî, tedavîya vekirî (lênerîna bêyî razana li nexweşxanê) ya beledîyê, mamoste, midûrê dibistanê, daîreya kar, meclîsa wîlayetê, lênerîna tawankara yan jî meqamên dinî lênerînê û/ kêsên ji bo mirovê ciwan giring bin.

- Xizmeta civakî berpirsiyarê xebata grûba civakî û yê dokumentasyonê (belgekirinê) yê. Lêkolin wekhev li gor beşa 11 benda 1 SoL qanûna xizmeta civakî tê vekirin. Pê de lêkolîna SAVRY (Structured Assessment of Violence Risk in Youth) pêk tê. Ku ev alaveke ji bo nîrxandina ciwanên 13-20 salîye. Ev prosesa neqandinê li derdora SIG de te bi kar anîn ku li vir dubarebûna şideta sûçdarî û tawanbarîya cidî tê nîrxandin.

- Li derdora her mirovê ciwan planek tê çêkirin, bê mirov gerek bighêji kîjan hedefan û çawa mirov bighêjî van hedefan.

- Hedefa yekemîn ,mirov ciwanan ji derwî tawanbarìyê bihêle, mirov nehêle ku grûbên tawankar wana bigişînê nav xwe û mirov hêsanîyê ji wanre çêke ji bo ku ji grûbên tawankara derkevin.

- Sirveşartin ji bi hemû meqaman / kesan derbas dibe.

Çi alîkarîyan mirov dikarî bistîne?

Ev meqamên cuda/kesên alîkarîyê û destekê didin, bi piranî li ser bingeha ihtîyaca şexî vê alîkarîyê pêşkêş dikin. Bo nimûnê ihtîyaca li ser bingehê:

- Tawankarî
- Neçêbikaranînâ madeya narkotîk
- Tevahîya problêmên dibistanê
- Rewşa malbatê
- Teşhîsa psîkîyatrîk hwd(her wekî din)

Alîkarî ji van tiştan pêk tên

- Axaftin/sedem nîşan dan
- Lênerîn/şexsî/malbat
- Planên tedbîrê li dibistanê, li daîreya kar hwd(her wekî din)

Ez çawa dikarim têkilîyê bi SIG re daynim?

Tu kesî nasdike/ihtîyaca te bi SIG ve heye yan jî di derheqa SIG de tu hizir dike? Bi yê herî nêzîk ve têkilîyê dayne

- Xizmeta Sosyalê(civakî)
- Polîs
- Midûrê dibistanê/mentor(rêber)/kurator (şêwirdarê karên civakî)
- Asîstanê tetbîqî
- Lênerê tawankara/mifetişê tawankara
- Asîstanê daîreya kar
- Kesên din mîsal: psîkîyatrî, LSS, habîlîtasyon, Brå

<u>Bi hevdû re em bi hêzin</u>